JÎ LÊGERVANÊN RASTÎ, EDALET Û HESKİRİNÊ RE

Abdullah Ocalan

✯Salên 2000'an; çerxên şaristaniya tarî ku hejariyekî kûr li jinê daye jiyandin, li dijî vê bi înat wê bibe salên azadiya jinê. Ez di bingeh de vê şaristaniyê weke çerxekî tarî û qeşa girtî dibînim. Lê belê ji salên 2000'ân û pê de biharbûna jinê dest pê kiriye. Di demdirêjiya dîroka şaristaniyê de, li dijî zivistana dijwar û berfê dijwar ya serdestiyê spartî derewînî û zordariyê, li ser cinsa jinê weke berfînên ku berf û qeşayê kun dike, azadbûnên jinê pêk tê. Bi vê, her biharbûna jinê, bihara jinê, li dijî zivistan û berfê dijwar kulîlkvedan, kulîlkvedana tevgera azadiya jinê pêk tê. Ez vê radeyê girîng dibînim. Ez bi jinê re bi dil û mejiyê xwe têkil bûm, bûm yek. Yekbûna min bi jinê re, yekbûnekî ji eniya min, ji mejiya min e. **Nasnameya min ev e, formasyona min ev e, lênêrîna min li jinê ev e.** Li ser vî bingehî ji biharbûna azadiyê re, ji kulîlkvedana azadiyê re dibêjim, hezar silav. Ez ji zarokan re, ji hemûyan re wê dibêjim. Min dixwest ez bibim yek ji we. 50 salî me, lê weke zarokan im. Hem ji bo jinan, hem ji bo zarokan, hem ji bo gelê me wek kesekî mayînê birûmet dibînim.

✯**Dema ber bi çûna kongra ve, ez ji bo we sê xebatên bingehîn pêşniyar dikim. Ya yekem, dîroka jinê. Ya dûyem, şoreşa jinê, yanî azadbûna jinê. Ya sêyem peymana civakî ya jinê. Wan xebatan kurtir bikin.**

✯Li Rojhilata Navîn sêyemîn xebata min ya destanî, li ser azadiya jinê ye. Li gorî min, ev xebatê ku pêwîst bû ji beriya xebatên rizgariya welat û kedê bihata destgirtin. Xebata herî zehmet bû. Jin, çîn, netew û cinsa perçiqî ya destpêk û bingehîn ya paşverûtî û koletiyê ye. Di xuyakirinê de cewaziya cins, ji bo newekhevî û çewisandinê dibe sedem. Dema dîrok bi kûr Ji lêgervanên rastî,edalet û heskirinê re

✯Aniya xwe bê lêkolan, wê bê zanîn ku jin, bi temamî goriyên despêk yên serdestiya civak û siyasetê ye. Ji bo newekhevî û koletiya li ser mirovahiyê tê ferz kirin, çîna wê ya destpêk e. Piştî kû jin hat kolekirin, anîn warê tiştekî (nesneyekî) sernerm û kedî ya malê, dor gihîştiye afirandina civak û dewletê. Piştî ku zilamê zordar û derewîn li jinê xist, bi wêra ku ji wê girtî ve destê xwe dirêjî perçiqandin û dîlgirtina mirovên din û cinsê xwe kiriye, mîtolojî û olên ku sazûmanên herî derewîn yên ramanê afirandiye. Em qala ol û mîtolojiyên serdest û kedxwaran yên derewîn û zordariyê hildiberîne dikin. Dema li ol û mîtolojiyan tê nêrîn, jin bi hezaran fêl (hîle) û zordariyan, gav bi gav ji texta xwedawend ya bixemil tê xistin, girîngî nayê dayîn û herî dawî tê tunekirin. Ez şervanê azadiyê me, tevî vê ne gengaz bû ku min vê yekê nedîtibana. Weke zarokê azadiyê yê van xakan ku olê xwedawenda dayîk afirandiye û bûye warê xwedawendên dildariyê (eşqê) yên destpêk, minê bixwesta mezinên me yên destpêk û çavkaniyên me yên dildariyê têbigihînim, lêkolîn bikim û hêcetên wan yên hebûnê bibînim. Li ser vî bingehî kûraniya ku ez gihîştim girîng e. Min dît ku pirsgirêka azadiya jinê ji netewbûn û çînbûnê zortir e. Ez wisa pê de ketim. Derfetên min bisînor in, ji bo çareseriyê nêzîkbûnek cidî ya felsefî û teorî pêwîst e. Pêwîst e were hizirîn ku çareserî ka wê bi kîjan şêwaza nêzîkbûnê çêdibe. Hûn jî dikarin lêhûr bibin. Ez dikarim bêjim tiştê ku min ji zarokatiya xwe digerî, min di çerxa neolîtîk de dît. Tiştê ku civaka neolîtîk, Hîlala Berhemdar tê gotin di coxrafyaya Kurdistana îro de çêdibe. Di bilindkirina şaristaniyê de keda me heye. Afirandina şaristaniyên Misir û Sûmer bi neolîtîk re, yanî bi me re çêbûye. Enkiyê xudayê Sûmeran yê qurnaz, nûnertiya bavikê nîv zanedar, ne tam zordar, nîv sazûmankar dike. Navê Ninhursag, Înanna navên "nîne", "ana" (pîrejîn, dayîk) ji wir tên. Ger derfeta min hebûya, min dixwest ka çi ji serê xwedê, xwedawendan hat binivîsinim. "Çi ji serê xwedê û xwedawendê hat? Hûn dikarin binivîsinin. Nivîsandina romana kêşeyan gelek balkêş e. Yê çanda axê afirandî jin e. Jin hêzekî awarte ye. Evqas bihêzbûna çanda dayîk, ji vir tê. Çanda jinê û çanda gel, ji neolîtîk dest pê dike. **Şoreşa neolîtîk bixwe demokrasî ye**. Paşketî ye lê, cewherê wê demokrasî ye. Çanda xwedawend ji Star tê heta Îştar, Înanna û Afrodît.

✯Îştar, Star, Stêrk ji wir tê. Weke stêrk rojbûna we silav dikim. Emê hewl bidin da ku ev çanda xwedawendê bijînin. Ev çanda me ye. Piştî damezrandina dewletên wek Misir, Sûmer û Babîl, bi azadiya jinê re çandên gelan jî hatiye çewisandin, li bin maye. Çanda gel jî bi çewisandina xebatê dewletê, mîna nasnameya jinê li bin maye, xwe nekariye bi azadiyane li ser piya bihêle. Têkoşîna

azadiya jinê, wê bi hêle ku çanda gel jî derkeve eşkerebûnê. **Hem jin hem jî gel di nav çerxa neolîtîk de asê maye.** Ne tenê pêşveçûna jinê, pêşveçûna gelan jî ji wê çerxê û pê ve zêde pêş neketiye. Ji ber vê yekê divê ji şoreşa neolîtîk û pê de, di encama lêhûrbûnekî de were nirxandin.

★Çanda xwedawenda dayîk ya dema neolîtîk, di dayîkên Kurdan de hîn bi awayekî xurt dijî. Jinên Kurd çiqas îdîaya xwe diparêzin, di cewherê wan de zêde girêdan û rêzdariya wan li şêwaza ol, çand û jiyana serdestiya zilam nîne. Girêdan û rêzdariya wan heyîn jî, ji ber çewisandin û kevneşopiyên madî û manewî, vê rewşê ji neçariyê pejirandine, dema derfet dîtin jî serî hildidin. Ne tenê jinên Kurd, tevayî jinên Rojhilata Navîn wiha ye. Di cewhera felsefeya Zerdeşt de li hember tiştê Semîtîk yê kole, berxwedanek heye. Ger di malbatên me de hin tiştên erênî hebin, kevneşopa Zerdeşt e. Zerdeşt li hember giyana koledariyê, raperîna destpêk e. Li ser vî bingehî di tevayî serhildanên demokratîk yên Rojhilata Navîn de cihekî jinê yê taybet heye. Weke hêza afirîner ya neolîtîkê, bi tu awayî ji aliyê civaka çînî ve xistina xwe nikare bipejirîne. her tim biguman li serdestiya zilam meyzandiye. Bi temamî di cewaziya wê de ye ku mafên wê tê xwarin. Bêçaretiya wê, wê di nav êşên kûr de dihêle. Di zanabûna vê de ye ku tu demî ne şayanê di xistina vê rewşê de ye. Ew di bingeh de bixefî alîgirê çanda xwedawend e. Tu carî jidil de bawerî nedaye xwedayên zilam. Di zanebûna vê de ye ku her tim di nava valatiyekê de ye. Bi êş û bi hêrs dihese ku rêz û hezkirina ku mafê wê ye, nayê nîşandan. Tu carî nebexşandiye ku ewqas neçarî destê zilam hatiye xistin, zêdetir jî xwe nebexşandiye. Di cewaziya wê de ye ku zilam gelek ji dûrî hezkirinê ye, hovane û bê exlaq e. Baş dizane ku ji hêza dildariyê dûr e. **Gorîbûna ewqas nakokîyan, berevajiya vê jinê ji nezaniyê zêdetir, nêzîkî zanayiyê kiriye.** Dema bawerî da, di hêza nîşandana girêdaniya herî xurt de li ser wê nîne. Di giştî de tevayî jin, bi taybetî jinên Rojhilata Navîn, ji ber van taybetmendiyên xwe hêza civaka demokratîk ya herî zindî û çalakiyê ye. Divê bala jinê bê kirin. Têkoşîna azadiya jinê ji têkoşîna çînî bi nirxtir e. Jin garantiya mafê mirovan û demokratîkbûnê ye. Asta azadiya jinê, asta azadiya civakê diyar dike. Pêşketinên ne bi eksena jinê, nekare serbikeve. Ji ber vê yekê ne tenê ya jina Kurd e jî, ez dibêjim, ronesansa jinê ya Rojhilata Navîn e. Ronesansa li Rojhilata Navîn, li ser bingeha derketina jinê çêdibe. Ez li dijî qirêjbûna spartî dogmayên mezin, paşverûtî û serdestiya zilam lêhûr dibim. Ew, incax bi ronesansa jinê derbas biye.

★Jin weke çîna herî kevin û herî di jêr de, mijarekî çewisandin û kedxwariyê qatqatî ye. Pirsgirêka jinê ku nû-nû pêşî vedibe, qasî ku çerçoveya civaka kapîtalîst danegire mijarekî berfireh e. Azadiya jinê weke pîvana giştî ya tevayî azadiyan, xwe avêtina gavên xwe yên destpêk amade dike.

★Ji çerxa jinê derbasbûna çerxa zilam, li dijî jinê rêya windabûnên mezin vekiriye. Dîroka civaka çînî ya 5000 salî, zêdetir ji jinê re daye windakirin. Çewisandin, heqaret, cewaziya cinsiyetiyê bi her hêlê, newekheviya her cureyî, li şayanê (layîqê) jinê hatîye dîtin. Jina ku weke şewitî, hatiye şewitandin, tê hewldan ku ji bin xwelî ji nû ve bê paqijkirin û bê derxistin. Şûna ku tevayî mafên kesî, bê ku bi tu mercê ve bê girêdan, ji jinê re bê nasîn, di dawiyê de, ew jî bisînor anîna rojevê, bi aliyên kûr, dîrokî yên bêmafiyê ve têkildar e. **Mijar qasî ku bibe şaxekî zanista civakê, berfireh e û bi serê xwe ji têkoşîna siyasî û hûqûqa demokratîk, bi bername, biplan, rêkxistî re, qasî ku hewldana wadeya demdirêj pêwîst bike girîng e.** Ji têkoşîna netewî û çînî hem di aliyê cewher, hem jî aliyê şêwe taybetir û jiyanî ye.

★Di roja me de incax navê pirsgirêk hatiye danîn, naverokê xwe tam nehatiye diyarkiriin. Tam bi wateya xwe ve bername, stratejî, şêweyên rêxistin û çalakiya nerûniştiye rojevê. **Çawa dîrok, li ser bingeha koletiya cinsê jinê, weke dîrokekî zordarî, şer, mêtîngerî û derewîn dest bi şaristniya civaka çînî kir, bi têkoşîna azadiya jinê û serkeftina wê re jî weke dîrokekî azadî, aştî û rastiyê, wê ji nû ve bê afirandin û were nivîsandin. Tevayî nîşanek (gösterge) didin nîşa ku di dema berbanga şaristaniya nû de, azadiya jinê wê rola diyarker bileyîze û dubare, lê di asta jortir de wê çerxekî jina azad were jiyandin.**

★Di pêşketina demokrasiya hemdem de mafê mirovan û azadiya jinê, di serî mijaran de tê ku girîngiya wê her zêde bibe. Dibe nirxandinekî kêm ku mirov mafê mirovan û azadiya jinê yek ji saziyên civaka kapîtalîst bihesibîne, berevajî di pêvajoya derbaskirina şaristaniya kapîtalîst de,

dema kemahiya rastiya wê ya rêvebirî û jiyanê eşkere bûyî, ew pêşketine. Mafê mirovan û azadiya jinê, du parçeyên bingehîn yên demokratîkbûna civakê yên giştî ne.

★Her ku çerçoveya şaristaniya klasîk tê derbaskirin, şansên wan yên pêşketinê zêde dibin û di rêya ku diçe pêşketina şaristaniya nû de, dibin du rastiyên bingehîn ku pêvajoyê herî zêde diyar dikin. Ne hilberînekî mercên civakê kapîtalîst, wê jî şûn de dihele, pêşketina civakî ne. Bi vê aliyê xwe ve bersiva pîvanên demokratîk ya hemdem dide. Pêşketina demokratîk ya hemdem, herî zêde xwe di mafê mirovan û azadiya jinê de dide nîşandan. Çerçoveya yasaya şaristaniya nû, di bingeh de wê mafê mirovan diyar bike, di bingeh de zemîna wê ya civakî, wê azadiya jinê çêbike. Peresan (ewrîm) û kûraniya demokrasiya hemdem, pêşketinên di vê her dû şaxê de wê diyar bikin. Wisa diyar e ku di derketina şaristaniya nû de ev her du mijar wê rola serekî bilîzin.

★Serfiraziya civaka demokratîk ya dawînî bi jinê ve gengaz e. Ji neolîtîk û vir ve gel û jinê ku li beramberê civaka çînî de asê mane, weke xûdana pêngava demokratîk ya rastîn hem tola xwe ji dîrokê hildide, hem jî xwe bi cihkirina çepê şaristaniya demokratîk ya bilindbûyî ve antîteza pêwîst diafirîne, bi rastî di çûna ber bi civaka wekhev û azad de hêza civakî ya herî saxlem pêk tîne. Li Rojhilata Navîn antîtezbûyîna demokratîkbûna civakê, wê zêdetir di saya jinê de û piştî wê jî di saya ciwaniyê de çêbibe. Şiyarbûna jinê, wek hêza pêşeng ya civakê, di sahneya dîrokî de cih girtina wê, di nirxa antîtezekî rastîn de ye. **Cîhana jinê, zanedarî, wîjdanî, heskirin û parastina jinê, berendama afirandina nirxên şaristaniyî yên cewaz e.** Ji ber karakterên şaristaniyan yên çînî, li ser bingeha serdestiya zilam pêş dikeve, ev yek dibe sedem ku jin ji vî alî ve jî jinê tîne merca antîtezekî xurt. Hem derbaskirina cewaziyên çînî yên civakan, hem jî bi dawî anîna serdestiya zilam, ji wêdetirê antîtezbûyînê, di nirxa senteza nû de ye. **Her wiha di demokratîkbûna civaka Rojhilata Navîn de merca jinê ya pêşeng di çapê cîhanê de hem di merca antîtezê de (çavkaniya xwe ji Rojhilata Navînbûyînê digire) hem jî merca sentezê de taybetmendiyên dîrokî hildigire.**

★Azadiya jinê di şêwegirtina şaristaniya nû de wê rola her terazîner (dengeleyici) û wekheviyane bilîze. Jina ku ji rûxîna civaka neolîtîk û vir ve ji civakê hatî birin, wê dûbare di mercên rêzdar, azadiyane û wekheviyane de cihê xwe bigire. Ji bo vê wê tevayî xebatên teorîk, bernameyî, rêxistinî û çalakiyî were kirin. Rastiya jinê, ji têgehên çîna proleter û netewa hatî perçiqandin ku demekî gelek qala wê hat kirin, mijarekî şênber (somût) û tê analîzkirin (tahlîlkirin) e mirov dikare bêje ku veguhertina civakê ya herî bingehîn, bi veguhertina ku wê jin pêk bîne ve diyar bibe. Jin çiqas wekhev û azad e, tevayî aliyê civakî jî ewqas wekhev û azad e. Weke payîdar di cihgirtina demokrasî û laîkiyê de rola demokratîkbûna jinê wê diyarker bibe. Li ser rastiya jinê ev bernameya kurt jî nîşa dike ku tevgerîna civaka nû wê di rengê jinê de rewşekî serekî bijî.

★Min xwest di nêzîkatiya jinê de hinek pêş ve biçim. Min xwest, ev her du mijar di berdewamiya dîrokê de bûye hestî rûxînim, taybetmendiyekî derxînim holê. Min xwest, ewên ku weke çînbûna herî kevin û kûr hatî perçiqandin, rastiyên xwe yên cins û cinsî ku weke çarenûs pejirandine û di bingeh de zêde ne cewaziya wê de ne, bê ku rêzdarî li tu rûbera (xemna) exlaqî û olî bigirin, derxînim holê, pêk bînim ku cinsên xwe ji serkeftina xweyîbûnê û azadiyê nekişînin, berevajiya vê yekê jî weke exlaqekî azad, zayendiyên xwe weke meta (mal) bikar neynin. Lê ev fedekariya me ya mezin, di nava me û dervey me de ji aliyê gelek jin û zilam ve hate xwestin li hemberî min bê karanîn. Ez ne di vê rewşê de bûm ku ez bitirsim. Neserkeftina jina azad û jiyana azad, min her tim weke kêmahiyekê mezin dît û li hember tepkî girt. Lê belê heta vê temenê xwe, di vê mijarê de bin neketinê, min derfetekî mezin ji bo xwe hesiband. Vê yekê weke mîras û kombûnekî mezin nirxandina we, bi taybetî jinên ku di îdîaya xwe ya azadiyê de jidil û hêzdar, min derfetekî mezin hesiband.

★Min damezrandina PJA'ê bi rêzdarî pêşwaz kir**. Ev yek di azadiyane diyarkirina çarenûsên (qeder) xwe de gavekî dîrokî, di eşkerekirin û analîzkirina nakokiyan de dikare pergalekî bingehîn bilîze.** Lê belê girîng e ku bi lê nêrînekî mîtolojîk, olî, felsefî û zanistî, di nava tevayî aliyê dîrokî û rojevî de analîz bikin, li ser vî bingehî xefekî şêweya îdeolojîk, bernameyî, rêxistinî û çalakiya xet bikin û jindar bikin. Sazkirina van ya akademiyekî azadiyê pêwîst e û di cih de ye. Xebatên weqfa azad û di saziyên civaka sivîl yên her cureyî de pratîkbûna wan, di pêkanîna

nasnameya azad û jiyanê de dibe ku rola mezin bilîze. Di giştî de di sazkirina civaka demokratîk de rola pêşengtî lîstina wan, ji ber bastûra wan ya şênber û selmana (ispata) veguhertina wan e.

★Berîdana min ya pirsgirêka jinê ji wêdetira pirsgirêka şerefê ya kesî ye. Tam li dijî pêdiviyên zayendiya hêsan e jî. Ji min re weke mêrxasiyekî rastîn hat ku hevdîtina cinsan bi mîsoger derxînim jortira ajoya heywanî ya zayendî (cînselî), derxînim asta dostanî û rêhevaltiya mezin û ketim cewaziya wê ku xwe ji kişandina jinê newêrektî ye. Tirs, zilamê serdest afirandibû. Ez ne zilamekî ewqas hêja bûm. Dayîka min ji min re digot; "tû nikarî bibî reîsa malbatê jî". Ev yek ne xema min bû. Gelek girîng bû ku ez bibim zilamekî cewaz. Dema ez qala kuştina zilam dikim, wan diyar dikim. Di vê mijarê de wêrek bûyîn, wêrektiya herî mezin e. Ez weke zilamekî, zilamê di xwe de baş kuşt. Ev yek wêrektiya herî mezin e. Ezê vê yekê hem ji bo rêzdariya dayîkê, hem jî ji bo dildariyê bêjim. Di xûyakirinê de herkes dibe dildar, ji dayîka xwe hez dike. Ez vê yekê weke dûrûtî dibînim. Ji bo min tu girîngiya wê nîne. Dibêje "gelek ji te hez dikim", xençerê lê dide. Di bin navê namûsê de vê lîstikê dilîze. Dema dibêje "hez dikim" jî di cara duyemîn de bi kêrê lê dida. Weke cins jinê diêşîne, mehfa fizîk, hiş û hestên wî tîne. Zilamê sosyalîst yê ku "her heye ez im", heta jin jî xwe ji fîgûrên vê lîstikê yên hêsan rizgar nedikirin. Ev bêmafî gelek xofdar e. Ewqas mirov bi navê dildariyê, rastê tevkujiyan tên. Tevkuştina jinê; ji kuştina çand, ji tevkuştina gel bi xetertir e.

★Jin; xwediyê jiyanê, axê yê rastîn e. Divê em bi navê dildariyê, pêşiya tevkuştina giyan û fizîka jinê bigirin. Divê di jinê de namûs hebe, lê ev yek bi kêrê, bi kuştinê nabe. Min got wiha nayê jiyandin û bi hêza tehnbûna azadiyê ve min giranî da pirsgirêkê. Di bingeh de ez dixwazim di mijara jinê de romanek binivîsim. Ger derfet bibînim ezê binivîsînim. Hêza min qasî bi we re hevaltiya herî xurt bike jî heye. Û heta roja îro min dahûrandin, diyalog, axaftinên berfirehî jî kirin. Ne weke xwediyê we, weke hûnermendekî ji rawestîna fizîkekî xweşik, heya çîrûskbûna jîrayiya (zeka) we û bi dengê zimanê we, heta hûn bigihîjin asta tama herî şîrîn, min destkariya her tiştê we kir. Hûn mezin bûn, mezin hatin xwedîkirin, lê hûn xeşîm bûn. Jiyana bilanet û ezbeniyên we yên zilam li ber serê we bûn. Hûn ji dûrî tecrûbe û hostatiyê bûn ku li hemberî wan û li gel wan şerê cinsî ya mezin bidin. Bi vê êşê we xwe ji kendalan avêt. Di nav agir de we xwe şewitand, bi bombeyan we xwe parçe kir. **Weke jin, bi navê mêrxasiyê her tiştî kir. Lê hûn tenê xwe bûn.** Zilamtiya li hemberî we, nedixwest ji nêzîkatiya xwe ya qebe wêdetir, nêzîkatiyekî bi cureya din, dostanî û rêhevaltiya wekhevan ya mezin bîne bîra xwe. Weke kulîlkan diçilmisîn. Di vê mijarê de pêwîst e çete ji nû ve werin analîzkirin. Divê heval vê yekê bikin. Ev yek qasî tê texmînkirin bi xetertir e. Min qala çeteya çarmend kiribû. Ev yek lingê çeteya Tirkiye pêk tîne. Yek ji linga çeteyan ya derve heye. Ev jî yê ku Çûrûkkaya avakirîn in. Ew çeteya xanedaniyê ne. Eşîrên teng in, malbatî, heta mezhebî ne. Aliyên wan yên zazayî jî hene. Ew gelek çavtarî ne û nirx nadin mirovan. Hogir hebû, Talabanî wî revand Ewropayê. Kor Cemal hebû, gelek ciwanên zanîngehê tevkuşt. **Herifandinên wan li ser jinê jî gelek kur in. Bi şîdet li dijî azadiya jinê derketin. Pêwîst e hemû ji nû ve were dest girtin.**

★Qasî ku jidil de bawerî bidim çanda xwedawenda, ez gihîştim hêza rêzdarî û hezkirinê. Her çiqas xayîn û hevkarê wan derbikevin jî, jibîrkirina yên ku bi dil û can tevlî van hewldanan bûyîn, tu carî ne gengaz e. Lê şehîdên wê, ewên weke azîzeyên van xak û gelan her tim werin bibîranîn. Her yek ji wan merxasekî rast in, di rewşa xwedawend de ne. Hûn yên mayîn, min yekîtiya we û partîbûna we bi rêzdarî pêşwaz kir, ez bûm alîkar. Min her tim got, pêwîst e hûn bibin garantiya jiyana azad û xweşik. Wê rojekê misoger hûnê bigihîjin jina hêzdar ya ku bikare zilamê paşverû, derewîn û zordar bîne ser xetê; bi vê baweriyê min hewldana xwe heya dawî domand. Mirov bi tenê jinê ku bûye malê wî, nikare mezin bibe, nabe zilam. Ne min xwest wisa mezin bibim, ne jî min xwest ez bibim zilam; heta wiha bûyînê min weke bêrûmetî dît. Ez zanim, min jinê xist rewşekî zor. Min jinê anî warê parçeyek ji agir, ez vê jî dizanim. Ez zanim yên di nava xwe de dijminahî dikin, gelek bêmafî dikin jî hene. Min we tenê hişt, ez vê jî dizanim. **Lê rastiyekî herî girîng ku ez dixwazim hûn bizanin; pêwîst e hûn qasî çarenûsa şer jî, aştiyê jî diyar bikin, bihêz bibin. Bê vê jiyan heram e. Bê vê dildarî nabe. Bê vê tu bêrî nayê derbaskirin.**

★Tenêtî û cudatî, ji bo derxistina van mezinahiyan û serxistna serdestiyan, rêya ku pêwîst e were derbaskirin û fetûre deynê yên pêwîst bê dayîn e. Ev têkoşînekî zor e. Hûn dikarin tenê bimînin, ji tenê mayînê netirsin. Tenêtî xûdabûn e, bi wê re hûnê rastiya xwe bibînin. Li dûv hezkirinê erzan nakevin. Tenêtiya xwe vegerînin çavkaniya hêz û mezinahiyê ye. Ez nirxa mezin didim we. Hûn di rêyekî xweşik û rast de ne. Divê hûn vebin û xwe bikin serdest. Hûn rêhevalên birûmet in. Jixwe bawer bin. Ne pêwîst e hûn bêjin "emê çi bibin" dawî li tegihînên (anlayış) xwe yên cîhana kevin bînin. Li ser min penasînên wê yên pir xweş hene. Girêdana min bi we re wiha ye. Tevî dîroka qirêj ya 5 hezar salî, ez daxwaz dikim, hûn her ku biçe baştir bibin, li hember cîhana zilam tarî kirî xwe paqij bikin û rastiyên xwe biafirînin. Hem ji bo rêzdariya dayîk, hem jî li ser dildariyê ezê vê yekê bêjim.

★Li ser pirsgirêka jine weke tezan dihizirim. Di vê çerçovê de ji neolîtîk heya roja me xebatekî min ya berfireh heye. Ji biçûk ditina jina Kurd zêdetir, di serî de dayîk, min mezinkirina tevayi jinan bingeh girt. Min hewl da ku ez bikarim zanistî nêzîk bibim. Ji bo ku jin tezên xwe yên azadiyê heta bigihînin peymana civakî pêwîstî bi têkoşînê heye. Ez hewl didim ku perspektîfa zanistî, siyasî bînim ji vê re. Dîroka jinê di pirtûkên mîtolojiya çar cildan de heye. Mirov dikare ji wir lêgerînê bike. Jin di mîtolojiyê de hatiye veşartin, piştî vê jî, jixwe cihê wê di siyasetê de nine. Windakirina jinê, windakirina civak, wekhevî û azadiya di sosyalîzmê de ye. Pêşketina mêtîngerî û newekheviyê ye. Piştre xûdayên Yûnan pêş dikevin. Ji vê re çanda pêxemberiya li Rojhilata Navîn jî pê ve dibe. Rewşekî weke jin nîne pêş dikeve. Di roja me de pêwîst e veguherînin peymanekî civakî ya nû. Pirsgirêkekî zindî ye. Ez dem bi dem pirsa "divê çawa bê jiyan kirin" tînim rojevê. Di çareseriya pirsgirêka çînî û civakî de têkoşîna jinê rolekî girîng dileyîze. Ez ji pirsgirêka jinê re teng, weke aborî nanêrim. Ez bi hestên erzan nagirim dest. Zêdetir exlaqî û felsefî nêzîk dibim. Ne bi pêşdaraziyen olî ve, ne jî bi çanda tele vole ya roja me nêzîk dibim. Ger derfet çêbibin ezê hewl bidim da ku vê yekê derxînim holê. Ez exlaqa rojevî ya kevneşopî hilnadim cidiyetê, napejirinim. Li gorî min têgihîneka min heye. Ger derfet çêbibe, di pirtûka xwe de ez dixwazim di şêweya hêzan de vê yekê pêşwaz bikim. Ez dixwazim xetekî ya dîrokê bidim.

★**Li ser vî bingehî divê hûn peymana civakî ya jinê, di wesfa manîfestoya jinê de ji bo sedsala 21'ê ava bikin**. Ev mijar ne tenê ji bo jinên Kurd û Tirk, ji bo tevahî jinên cîhanê ye. Divê peymana civaka azad ya jinê, bibe hilberîna xebatekî fireh. Ev yek xwedî cewherekî gerdûnî û navnetewî ye. Divê tevgera jinê bi tevgera derdor ve bibe yek. Peymana zarok û derdor ji aliyê netewên yekbûyî ve hat weşandin. Divê tevgera jinê bi wan re bibe yek.

★Koletiya spartî kapîtalîzma sedsala 20'an, mirov dikare ji gelek çavkaniyan lê bikole. Hûn dikarin peymana civaka azad wiha pêk bînîn û dikarin 5-10 sal wiha bijîn. Tiştek nabe, di nava vê demê de xebatên xwe yên îdeolojîk-polîtîk bi rêve bibin. Da ku hûn bigihîn peymana azadiya civakê, divê ev yek bidome.

★**Ez dixwazim hûn kûr bibin, her yek ji we dikare xwe bike dergehekî. Dikarin xwe bînin warê çavkaniyekî bingehîn. Heskirina min ji herkesî re ye. Ez li benda xwedawendên mezin im. Azadî ji bo jinê ji her tiştî nirxdartir e**. Azadiya jinê, ezêbî (bekarlık), tenê ne di wateya zayendiyê de ye. Ez jî xwe weke bakîre (keçînî) dihesibînim. Yê girîng paqijiya giyan û dil e azadbûna vê ye. Ger tu giyana xwe paqij bigirî, fîzîka te jî xweşik dibe. Jinekî wiha mezin dibe. Ezê hinek bêjim Budawarî, lê ne tam wisa ye? Xwe bidin nasname û şerefa xwe, ev yê herî xweşik e ji bo we. Divê hûn fedekariyê bikin. Dubare dibêjim! Di kesayeta jinê de wê civak azad bibe. Xwezayî ye ku zoriyê bibînin û zorê bidin. Bi misoger ne meselekî ku biçûk bibînin. Rêzdariya li hember gel çi be, rêzdariya li hember jinê jî di heman wateyê de ye. Helbet çewtî û kemahî dibe ku çêbibin, lê ev, divê li peşiya azadiya jinê nebe asteng. Min xwest pêşiya we vebikim. Tiştên civaka çînî li ser we ferz kirî, dîroka şaristaniyê ya 2-3'ê hezar salî ka çi gotiye, ka zilam çi gotiye divê ne di xema we de be. **Berxwedana herî mezin, di kesayeta jina azad de israr e**. Di pêşerojê de hînekan ji ber êşan xwe şewitandin. Di kesayeta xwe ya azad de îsrar, vegotina herî mezin ya girêdaniya bi min re ye.

★We girîng e. Divê hûn li hember hevdû xofdar û dijûnek nêzîk nebin. Divê ev dem were derbas kirin. Divê jin li ser xwe kûr bibe, bi şiyarî di kesayeta xwe û wîjdana xwe de bigihîje

kûrbûnê. Kesayetiyên xwe yên azad pêş bixin. Kesayeta xwedawend biparêzin. Li ser nameyên min yen dawî hûr bibin. Hûnê bikarin gelek tişt bigirin û bibînin. Ne roja hizîrina hêsan e. Hûn jî bi baldarî tevbigerin, bala parastina rewa bikin. Şûna ku hûn bi gîrî dilên xwe hênik bikin, bi mejiyên xwe yekîtiya dilên xwe çêbikîn. Weke bersiva jiyanê, divê hûn hêza xwe ya wateyê pêş bixîn.

★Bi APO're 24 seat jiyan kirin! Ev yek di heman demê de mamikek e. Ez bawer dikim di mijara jinê de çanda spartî xiyanet û înkarê ku şaristanî li ser ferz kiriye min rûxand. Vegotina rêzdariya min li we ev e. Ez nikarim vê yekê ne bi hestên helbestvanî, ne jî bi mijarên felsefê ve vebêjim. Lê aliyê min yê li dijî serdestiya zilam, zor û çewisandinên balkêş e. Min dahûrandinekî zanistiya vê ya dîrokî mezin e danî holê. Ez daxwaz dikim hûn bê ku bibin pergala lanetî û kirêtiyê, bi rêzdarî bijîn û xwe li ser vî bingehî hêzdar bikin.

★Diyalogên ku min li vêderê kirî, ez diyarî we dikim. Weke dibistana azadiyê bi kar bînin. Ev dibistan divê ji bo jiyana nû û aştiyê bibe cihê perwerdê. Ji bo dayîkan jî bibe cihê perwerdê. Divê destê zilamê qirêj, destê jina qirêj lê nekeve projeya jiyana azad di vir de derbasî jiyanê bikin. Ez nabêjim perestgeha (tapinak) jinê, çawa ku di malê giştî de û di malê taybet de mefa jin anîn, divê jinê di wir de bi çanda xwedawenda mezin bivejînin û bigihînin asta xwedawendan. **Di jiyanê de weke xwediyê hêzê, divê hûn li ser axên xwe, li ser lingên xwe rawestin. Xwe tenê nehesibînin. Erkê we pîroz e. Yên nezan bixeter in.** Ji bo zanînê jî asta akademîk pêwîst e**. Têkoşîna yê nezan bi xeter e.** Hûn dikarin hewldanekî mezin bigirin ber çava. Weke xwediyê kedê, hewlê bê ku lez bikin, bihedar (sabir) û birik hûn dikarin hinek encam bistînin. Ger hûn asta perwerdeya ku min pêşwazî we kir bişopînin, hûn jî wê bigihîn heman encaman. **Dema jin çareser bû, cîhan pir cewaz xweşik dibe.** Niha jiyan ji bo jinê tipîtarî ye. Ronahiya spartî jinê ji tevayî ronahiyan binirxtir e. Min dixwest di mijara jinê û ronahiya jinê de hev bibînim û bibim yek. Li ser vî bingehî min di parêznameya xwe de cihekî bilind ji jinê re vekiriye. Parêznameya min ji bo we jinan jî dibe şansê derketinekî. Dibe ku biçe gûhfirebûnê (gûhnedêriyê). Zimanbaziya (lafazanî) çepê di me de gelek xûrt e. Bi zimanbaziyên hêsan ve nayê derbaskirin. Ji vê yekê re bibin asteng. Nîqaşê kur bikin. Ji bo jinê jî mijarekî girîng e. Divê hûn cewherê wê bigirin û pir baş ronî bikin. Pêdiviya we bi lêhûrbûnê heye. Hûn dikarin parêznameyên min bigirin û binirxînin.

★Êdî hevdû sûcdar nekin. Di Kurdan de ev hinek heye. Jixwe têra xwe hûn hatine lanetkirin. Qasî çiya xalên we yên lihevhatinê heye. Divê hûn çanda aştî û biratiyê ji kûraniya xwe ve bigirin dest. Aştiyane bûyîn ne lewazbûn e. Kesê ku aştiyê bihêz bigire dest, di bingeh de kesa herî xurt e. Divê şoreşa zîhnî were jiyandin. Helbet wê rexne hebin. Dîroka koletiya jinê ya 5 hezar salî rast hatiye analîzkirin. Bingehên wê yên azadiyê rast hatiye danîn. Hûn dikarin çarenûsa xwe bixwe diyar bikin. Nekevin cudahiyên hestewarî. Dostane, biratî, serkeftinê bingeh bigirin. pêwîst e jin di şoreşa zîhnî de cihê xwe bigire. Divê hûn parêznameyên min li pirsgirêkên xwe wekî xwe pêk bînin. Têgihîna parêznameya min ya dîrok, felsefe û şêwazên li gorî rastiya xwe li hev bînin. Dîroka jinê binivîsînin. Di parêznameyên min de di asta jinê de kûraniyekî mezin heye. Parêznameyên min herî baş jin dinirxînin. Pirsgirêka jinê ne tenê di jina Kurd de heye, jina li Ewropayê jî heye. Ev rade gerdûnî ye. Pirsgirêka jinê, pirsgirêka demokratîkbûnê ya herî girîng e. Heta ku jin nebe demokratîk, civak nabe demokratîk. Nan, av, şeref, jiyan bi vê ve girêdayî ye. Divê hûn perwerdeyên xwe di şaxê mîtolojî, felsefe, zanista dîrokê û hûner de bikin. Bi vê zanînê di roja me de rêxistinên civaka sivîl biafirînin. Divê tevgera jinê bi temamî rêbaza demokratîk ya zagonî bingeh bigire. Ez şervanê tevgera azadiya jinê me. Min bi têkoşîna azadiyê re bersiv da ku bibim kurê dayîkekî baş. Li ser vî bingehî min rêzdarî pêş xist. Min got "zarokê dayîkekî baş wiha dibe". Pêwîst e trajediya dayîkan bigihînin çareseriya rast. Pêwîst e eniya çanda paş vebikin. Êşa bi hezaran dayîk, qêrîna wan ya can heye. Li Batmanê întîxar hene. Tiştekî hovane ye. Min van pir baş lêkolî. Min di rojnameyê de ragihandina baroya Batmanê xwendibû. Li malê bab jî, li malê zilam jî heman çewisandin hene. Mînak di demên dawî de jinên Amed û Batman vedikolim. Pirsgirêkên jinê yên herî giran hene. Jin cihê çûyînê nabîne, xwe dikuje. Cîhan dest diavêje wan. New York Times jî vê yekê vedikole. Di we de bêwîjdaniyekî mezin heye. Ew mirovên me ne;

gelek ji wan jî yarên me ne. Bi hezaran mirovên me yên tî û birçî hene. Gundiyên me hene. Divê we dest biavêta wan. Malbat dikujin, ne yekser ango rasterast. Di vê mijarê de gelek êşên hatîn jiyankirin hene. Divê em navendên ku wan bigire nava xwe damezirînin. Li Ruhayê divê ji bo jinan saziyên azad were afirandin. Dikarin malên wiha vekin. Li benda dewletê nemînin. Dewlet çênake, ji aliyê siyasî ve ne zelal e. Ev întîxar bi me re ji nêzîk ve têkildar e. We di dikarîbû pêşî li întîxara bigirta. Yekîtiya jinê dikarîbû dest biavêta vê yekê. Ew pirsgirêka civakê ne. Pêdiviya wan jinan ya aborî, huquqî hene. Divê hinek dirav (pere) û malên we jî hebin. Gelek komeleyên ji aliyê jinên Kurd ve hatî sazkirin hene. Her roj yekî nû tê sazkirin. Divê li wan deran perwerde bên dayîn. Li Tirkiyê derfetên perwerdê gelek zêde ne. Xwe perwerde bikin. Pêdiviya herkesî bi perwerdeya demokratîk heye. Pêwîst e rêxistinekî we ya banê hebe. Dibe ku gelek komele di bin banekî de bibin yek.

★Ji wir pê de divê hûn girîngî bidin xebata demoqratîk. Ji bo jin û ciwaniyê ku herî zêde pêdiviya wan bi aştî û azadiyê heye, bi her milî yekîtiyên jin û ciwanan, saziyên civaka sivîl yên herî serekî ne. Rêxistinên ku rast bûye bersiva merca dîrok û şênber û armancên wan yên siyasî, ji aliyekî ve astengiyên civaka kevneperest û dewleta zordar wê derbas bike, ji aliyê din ve wê rola pergalên civaka sivîl yên bingehîn bilîzin, tevahî civak wê wan bişopînin. Bi rêxistinekî ku di çawanî (nîtelîk) û çendahî (nîcelîk) de baş hatiye armanckirin û bawerî daye vê. Yekîtiyên ciwanî û jinê garantiya bingehîn ya serfiraziya civaka sivîl in. Projeya qada siyemîn wê bi pêşketina tevgera azad ya jinê ve jindar bibe. Demokratîkbûna jinê, di heman demê de partî û siyasetê jî dike demokratîk. Navendên herêmî ava bikin. Bila cihên we yên serbixwe hebin. Jin li dijî zorê ye. Pêdiviya herêmê jî bilezî ji vê yekê re heye. Di banê Rojhilata Navîn de Îran, Tirkiye, Suriye, Iraq dikeve pêvajoyekî dîrokî. Tirkiye neçar e xwe biguhere. Ev yek Rojhilata Navîn jî bibandor dike. **Di vir de jin di xalekî krîtîk de ye. Wateya wê ew e ku ez her gav qala jinê dikim.** Peyva Marxê ya "asta azadiya jinê, asta azadiya civakê ye" rast e. Ger hûn vejena (enerjî) xwe rast bidin xebatê, ger li her derê perwerdeyekî kûr, rêxistinekî kûr biafirînin, ewê her derê pêş bixe. Têgihînek kûr pêwîst dike. Rastiyekî civakî ye. Nû-nû tê nasîn, her ku biçe wê derkeve pêş. Wek gelek ked da. Di bingeh de min nekarî di mijara jinê de nameyekî dagirtî û tera xwe binivîsim. İncax di van hevdîtinan de min diyarkirinên kurt bes dît. Dixwazim divê mijarê de binivîsim.

★Di jinê de hinek hişyarî heye. Ez di azadiya jinê de biisrar im. Zanedar jî ji bo sedsala 21.'ê dibejin; "wê bibe sedsala jinê". Meseleya jinê meseleya civakî ye. Ne tenê meseleya cinsî ye. Li gorî min jî meseleyekî ya zilam e. Şaristanî, afirîna zilam ya 5 hezar salî ye, qirêj e. Zilam di vê qirêjbûnê de perçe perçe hildiweşe. Ezê li ser vê hûr bibim. Niha li ser meseleya zilamê radiwestim. Ezê vê yekê vebikim, bi xiroş li bendê bin.

★Jin hinek asta azadiyê girt. Ez jî bi zimanê pêxember diaxivim, wisa dijîm. Bi zimanê xudayan axaftin, wisa ne hêsanî ye. Divê meseleya jinê baş têbigihîjin. Emê jinê têxin şûna mirov. Bi şêweyek rûmet bê jiyandin. Wê demê wê bi jinê re bişeref bê jiyandin. Ezê vê yekê bixim warê rêgezê (îlke). Derxistina jina wiha mezin, dikare cîhan û civakê rizgar bike. Li ser vî bingehî ez hêzdar im. Divê hûn jî hêzdar bibin.

★Ji bo zilam jî wê dibêjim. Partiya Jina Azad vegotina şoreşê ye. Pêwîst e rêz jê re bê girtin. Nêzîkatiya li ser bingeha zayendiya teng ne rast e. **Jiyana bi jinê re divê weke hestên welatparêzî were nirxandin. Divê bi jinê azadbûyî re jiyandin rûmetê bide we**. Lênêrîna min bi jinê re jiyandin, ne jiyanekî cins e, jiyandina jiyana li derdora jinê, jiyandina çanda li derdora jinê pêk hatî girîng e. Jiyana li derdora jinê, zivirandin çolê. **Divê jiyana li derdora jinê were watedar kirin. Di xeta jiyanê de bimînin**. Têkîlî gelek hêsan in, wisa weke vexwarina devê pêwendî datînin, nabe! Meseleya şerefê cewaz e. Azadî, rizgarkirina jiyana xweşik û şerefê girîng e. Ger şeref nebe, wê te bigirin, têxin malê gştî an go taybet. Namûsa Kurdan hatiye xistin çi rewşê? Namûs ne ev e. Namûs parastina nasname, parastina hebûna xwe ya cewher e. Heskirin jî ji wir diafire. Ez di wateya kesî de dibêjim "divê Kurd çawa bijî". Heskirin, namûs, wek kes ez ketime pay vê ku ka divê Kurdekî binamûs çawa bijî? Ez hewl didim ku ji keçan re vê yekê bidim nasîn. Ez çima dibêjim heskirin, jin?. Divê dildarî, hezkirin hebe. Em kêm nez nakin, em mezin hez dikin. Ji bo dildariyê şer dikin. Ger hûn dixwazin hezkirin, şeref, rûmet pê bixin, ez ji bo vê çil

sal xerîk bûm, hîn li vê derê me. Ez di bin sêdara îdamê de mam. Ger hêza we hebe hûnê bixwînin. Hûnê afirandina hezkirin, hêrsê, afirandina hêvî, êşê, ji nû ve afirandina xwe, bi vî awayî mirovbûnê, gelê azad bûyînê serbixin. Hûnê wê demê xwe binasin. Keçekî ciwan bi zilam re bibe,ev yek mirov ditirsîne. Zilam jî bi jina kole re bibe, ez vê jî kîret dibînim.

★Berxwedana we baş e, di vê de kûr bibin, hûn dikarin xwe bigirin. Ger hûn destê xwe bidin zilamekî, hûn kûlîlk jî bibin, we diperçiqîne û diavêje. Girêdana jinê bi min re cewaz e. Min her tişt ji bo jinê heta dawî li ser bingeha berpirsiyariyê kir. Ger zilamê we bêhêz be, nebaş e. Ku zordar, derewîn be, heta dawî li dijî vê yekê derbikevin. Zilam kîrêtiyekî tirsnak e, ev çandekî çawa ye. Heya dawî min wê jî da. Jin ne wisa bû, ev çand piştre kifş bûn. Divê em çanda xwedawendê biafirînin, em nikarin li gorî xwe hez bikin. Weke yasayên şer, yasayên dildariyê jî hene. Em nikarin li gorî têgihînên xwe wisa hez bikin. Ez gelek, gelek girîng dibînim. Yên ku dibêjin "em bi te re ne" pir in. Parêznameya min pêşiya we vedike. Nebin du beş û neyên beramberê hev. Ez li vir tenê me, lê bi jinê re cîhanekî xweşik dijîm. Giraniya giştî li ser taybet nîne. Tiştekî wiha nabe, ev mantiqekî çawa ye? Her du jî tiştekî nava hev in. Ne gengaz e ku ji hev ben qut kirin. Yekbûna we girîng e. **Bi tenê xwe jî be, em dibînin jina azad bûyerek mezin e û em nirx jî didin. Divê rêz jê re were girtin, divê nêzîkatiyekî dostane û rêhevaltî bibe desthilat.**

★Tu wê hem ji bo jinekî xiyanet li erkên herî pîroz bikî û weke protestovan bijî, hem jî ji bo rêhevaltiya jinê tiştê dikeve şer milê te, tuyê pêk neynî. Ev yek nayê pejirandin! **Qasî jina ku jê re rêz bê girtin, pêwîst e zilamê ku jê re rêz bê girtin jî were afirandin. Divê kesayetên bêsînor biafirînin. Zilamê azad jî ketiye pêvajoyê afirandinê.** Divê hûn biryariya veguhertina xwe biparêzin. Gava partîbûnê dîrokî ye. Ji jina hatî tawanbarkirin, di çûna ber bi jina azad de meşa mezin e. **Gihîştina jina azad şeref e.** Şaş nêzîkatî lê, bêşerefî ye. **Gava bi navê partî hatî avêtin, gava bidestxistina şerefê ye.** Di cîhanê de destpêk e. Pêwîst e bi vê zanebûna deynin holê. Ev yek erkekî gelek dîrokî ye. Min jî xwest li ser navê xwe bibim alîkar. Di serî de PKK, ji tevayî derdorên têkîldar re min xwest bidim nîşandan ku, aliyekî vê yê hêsan bê girtin nîne. Bi rêgezî û bi cîdiyet, heya dawî min xwest nîşa bidim û li ser ferz bikim ku herî kêm qasî xudayên zilam yên zordar û derewîn, cîhana xwedawend jî ku hêza rastî û dildariyê ye were nasîn, rêzdarî û hezkirina pêwîst jidil were nîşandan. Di vê mijarê de hûn dikarin heya dawî kesayeta min binirxînin.

★Tenê veguhertina jinê têrê nake. Divê hûn weke Partiya jinê, pirsgirêka veguhertina zilam jî bigirin dest. Di nav hêzên xwe de perwerdekirina zilam watedar e. Bawerim kûrbûna we pêş ketiye. Li ser zilam pêşxistina xebatekî wiha watedar e. Yekîtî girîng e. Dikarin endamên zilam jî bigirin partiya xwe. İncax divê hîn pîvanên vê hebin, divê hûn van pîvanan bixwe deynîn.

★Divê ez diyar bikim ku ez cih didim rêgeza moral û estetîk, weke rêbaza jiyanê, hezkirin û rêzdarî. Girêdana min bi rêgeza "yan jiyan bi azadiyane bibe, yan wê hîç nebe" re ji dayîkbûnê heya mirinê ye an go heya dawînî ye. Hezkirin û rêzdarî, bi estetîk û exlaqa azad ve gengaz e. Tiştekî rast e ku ez jinê li navendê didim rûniştandin. **Ez neketim gumanan ku jina azad ya bi çalakiya azadiyê ve roj bibe û jiyan ku li derdora wê pêş bikeve, wê herî xweşîk û dostane bibe.** Ez neketim kompleksê. Şûna ol û civaka serdestiya zilam, min wateya mezin da têgihîna ol û civaka serdestiya xwedawend ku herî kêm wekheviya jinê pêşçav digire. Ji bo sazbûna vê, min karkeriya azadî û dildariya jinêkî mezin rêve bir. Min tu carî bi çavê milk li tu jinê, ti tu mirovê nenêrî, min nenêrand. Encamekî xwezayiya taybetmendiya (karaktera) min e ku, bê ku tawîz ji rastîbûna vê rêya xwe û ji nirxa, exlaqî û estetîk bidim, heya dawî ez meşiyam.

★Ber bi çûna Kongra Jina Azad ezê nirxandinan pêş bixim. Ez bawer im nîqaşên kongrê, bi van nirxandinan wê bi hêz bibe. Ji navê we bigire heya cewhera we, ez hêvîdar û bawer im ku, hûnê li gorî ahenga rengên xwezayê bi awayek afirîner her mijarê nîqaş bikin, rê vekin biryar û sazbûnên ku nirxên wan yên herî payîdar û pêkanînbar bin. Ez ji bo jinê dîroka 5 hezar salî analîz dikim. Ez dibêjim netewa herî kevn, çîna herî kevn. Ez bixwe kedkar û karkerekî mezin yê jinê me. Ji bo azadiya jinan, ji bo heskirinê hûn dikarin min weke karkerekî danasînin. Hûn dikarin wiha bibînin**. Ez xwe weke karkerê hezkirinê dinasînim, mezinbûna we daxwaz dikim**. Li ser

vî bingehî bigihîn çanda jinan, çanda xwedawendan. Ji ola zilam re, ji xwedêyê zilam re bêjin "na". Me wan xwedayên derxist eşkerebûnê. Emê çanda xwedawend biafirînin. Berxwe bidin, li xwe bigirin, bixwe bawer bin. Hin keç xwe qîjeqîj şewitandin. Tiştekî tirsnak e. Ez tevayî van ji bo bîranîna wan dibêjim.

★**Cîhanekî azad ku bê serxistin heye, jiyana azad ku bê serxistin heye. Ez ji bo vê dibêjim, bi we re me. Em dev ji xebata jinê bernadin**. Xebata jinê herî kêm qasî xebata PKK'ê girîng e, ji bo aştiyê bixebitin. **Ez ji bo we dijîm**.

★Weke peyva dawî, azadî û şerefa we çi pêwîst dike, ez dixwazim diyar bikim, hûn di girtina wê biryarê de azad in. Dibe ku ew bibe biryara şerekî bêhempa, dibe ku bibe biryara aştiyê jî. Lê ez bawerim hûnê yê herî rast bikin, bi mîsogerî yê ji bo berjewendiya tevayî mirovahî û gelê me pêk bînin; bi biryariya we ya azad û aştiya birûmet ve, ji kîderê û bi kîjan hêzê werin jî, li hember hêzên îmhayê hûnê heya dawî amadekar bin û hûn di vê hêzê de ne ku dikarin biryariya şerekî ku yên hatîn poşman bikin bigirin. Li ser vî bingehî ez dibêjim, divê hêzên we yên parastina rewa ya spartî hêza xwe ya cewher hebin. **Ji vir û pê de her tişt ku hûn gelek caran dibêjin, helwesta we ya "soza me wê bibe kiryara me" diyar bike**. Dîsa divê ez diyar bikim, her tişt ji bo wate dîtina vê peyvê û jîndarbûna vê pêyvê, we neçar dihêle. Ji ber pêwîstiya biryariya we, şert e ku hûn amadekariya her cureyî bikin, nekevin bêhayiyê (xeflet) û **pêwîst e mirinên ne di cih de, ji çarenûsiyê derxînin.**

★Van xakan çawa ku xwedawenda dayîk afirandiye, niha jî wê jina azad biafirîne. Hewldanekî cesur û xweşik e. Bixwe bawer bin. Xwedî li nasnameya xwe derbikevin. Hîç pêwîst nake hûn li hember êşan birûxin. Pêdiviya we mezinkirina rêzdarî û hezkirinê heye. Di bûyera azadiyê de xwe biparêzin. **Di warê xwedawendên dayîk û dildariyê de, bi hêza azadî û wekheviya ku hezaran sal dayîn windakirin ve, di xebat û şerê eksena jin de, ez hêvîdar û bawer im xweşikayî û jîrî, wê ji nû ve bê afirandin, yên heyîn qasî ku peymana civaka nû jîndar bike wê bigihîje hêza xwe ya cewher**. Mîsoger e ku di rêhevaltiya jinê ku bi hezkirin û rêzê ve dagirtî de ezê heya nefesa xwe ya dawî, weke karkerekî yê dildariyê, îdîa û hewldana xwe bidomînim. Qasî wate bidin û qasî pêdiviyên wan heyî, ez rêhevalê jinan im û mîsoger e ku ezê her wisa bimînim.

★Di dema pêş de nêzîkbûnên di astên wêjeyî (edebî) û felsefî de ezê hewl bidim ku alîkariyê bidim. Lê cewher hatiye pêşwaz kirin. Wekî ku di rêhevaltiyê de, di jiyana azad de, di ola xwedawend de û yên rêzdariya wan li hember dildariyê heyîn de, di şehîdên wê yên rûmetdar de jî hatiye selmandin (îspat kirin) ku, ev cewher nemiriyê bidestxistiye, tola xwe ji koletiyê, ji jina bêhn ketî û zilamê serdest ya qîrêj hildaye û **heya serfiraziyê** hîn jî wê hilde û serbikeve. Ez bi vê boneyê hêvî û daxwazên xwe jî diyar dikim. Ez bawer im **hûnê serkevin**, li ser vî bingehî ez we pîroz dikim, silav û hezkirinên xwe rê dikim û vê kûlîlkê ji bo tevahî jinan dişînim.

★Pêwîst e dîyalektîka min baş têbigihîjin. Şûna bi têgehên felsefî, ez dixwazim bi zimanê gel vebêjim (îfade bikim). Mixabin hûn zêde zimanê felsefî nizanin. Ji ber vê yekê ezê hewl bidim bi zimanê axaftinê vebêjim. Lîstika li ser me tê leyîstin ew e: Em bêjin civaka Kurd, gelê Kurd, Kurdistan dayîka me ye. Komplosaz hene. Di nav van de Amerîka, Rojava, zordarên Rojhilata Navîn, heta hevkarên Kurd jî hene. Ew bi zorî, bi entrîka ji aliyê me ve azadkirina dayîka me ku weke malê xwe dibînin, nikarin daqurtînin (bipejirînin). Ji ber ku li gorî van dayîka me, malekî ji aliyê herkesî ve tê bikaranîn e. Vê taybetmendiya min ya ku li ber radibe, min berê jî vegotibû. Dayîka min kifş kiribû. Aliyekî min ya wiha her hebû. Dayîka min dixwest quralên hişk bîne lêgera min ya jiyanê. Taybetmendiya ku di min de dît, li gorî xwe tedbîrên xwe digirt. Hevalên xwe ez bixwe hildibijêrim. Hem keç, hem zilam. Min meseleya Hasan Bîndal gelek vegot, ez qalê nakim. Di nava gund de wiha me. Li gorî quralên wan, di heft saliya xwe de hûn nikarin hevalên xwe hilbijêrin. Lê bê ku cewaziya yar-neyar bikim, divê min li gorî daxwaza, hevalê xwe hilbijartiba. Lê wê (dayîka min) bi dijmin re hevaltiyê nedixwest. Pevçûna me ya destpêk wiha dest pê kir. Ya yekem ev e. Ya duyem jî; ne li gorî daxwaza wan, min dixwest li gorî daxwaza xwe bigerim. Ez derdiketim çiya û mêrgan. Ji min re digot; "tu nikarî li gorî daxwaza xwe bigerî". Min jî digot; "na". Mala me yek qatî bû, cihekî vê ya tarî hebû. Axur bû, min bir wê derê, weke ku

bi darve dike, bi awayekî ku bê nefes bihêle, sê car qirka min diguvaşt û berdida. Digot; “tu car din nakî, ne?” Lê min jî rêyekî didît û weke gule ji destê wê direviyam. Çîroka min ya îdamê ya destpêk wiha dest pê kir. **Çîrokekî îdamê ya 45 salî** ye. Piştre jî ji min re digot; “tu pir dixebitî, derdorên te sûd ji te bigirin, di encam de tu tenê bimînî”. Niha em mînaka xwe bidomînin. Dayîk bû Kurd, bû giştî. Hat rewşa rastiyekî fenomen (bûyer). Pozîsyona min azadkirina dayîkê bû. Çi bû? Komplo çêbû. Me xwest bi jinê, bi dayîkê biguherînin. Zilam bûyê biyanî, xiyanet kiriye. Hem ji aliyê polîtîk, hem çandî ve. Dayîk her çiqas kêm jî be çand parastiye, nûnertiya çandê dike. Girêdana wê xurtir e. Lêgera min ya azadiyê, destpêkê feodalên Kurd ferq kirin. Piştre hêzên derve. Yanî Rojava, Amerîka û herî dawî Clînton ketin cewaziya vê, dest avêtin. Ev ne bûyerekî ji rêzê ye. Piştî salên 90’î bûyera herî girîng ya polîtîkaya Amerîka ye.

★**Ez hewl didim ku çanda xwedawenda dayîk ji nû ve zindî bikim**. Koka wê quntarên Toros-Zaxrosê ye. Çanda xwedewenda dayîk çanda me ye. Çanda Îştar-Înana, çanda jinê ya klasîk e. Stêrk tên warê xudaya. Di kolanên li Çatalhoyukê hatî kirin de tevayî peyker (heykel) jin in, ev derketiye holê. BZ. salên 4000-2000’an, êdî dema ku têgihîna civaka serdestiya zilam rûniştiye. Dema ez dibêjim; “divê malên azadiyê bînin warê perestgehan (tapinak)”, bila şaş neyê têgihîştin. Her yek ji wan sembolekî ne. Perestgehên azad ya jinê, malên azadiyê...

★**Ez jinan li sê koman parve dikim. Yên ku alîgirê hilbijêrka azadiyê ne, ez wan weke neviyê xwedawenda Îştar dinirxînim. Xwedawenda Îştar di bingeh de Kurd e**. Peyva Star ji wir tê. Qralên Hîtît jî girêdayî wê bûn. Li ser navê wê qraliyê dikirin. Di Sûmeran de Zîggurat hene, her çiqas jin di wir de hatibe xistin jî, li gorî jinên din pêşniyar nakim, lê pêwîst e azadiya jinê wê di wir de baş bibînin. Ew jinên xwedawendê ne. Rastiyekî ya azadiyê jî heye. Hûn dizanin malê taybet, malê giştî ji wir tê. Yek jî di Xirîstiyaniyê de rêxistina rahîbeyan heye. Pêwîst e rastiya rahîbeyan baş binirxînin. Îro di pêşketina civakên Ewropa de, vê rola jinê girîng e. Di civakên Îslam de ji ber ku ronîbûna jinê bi vî awayî jiyandin, di mercekî pir paşdemayî ye. Ez nabêjim bila bibin rahîbe, ez jiyana rahîbeyan li ser wan ferz nakim. Di vir de yê herî girîng, têgihîştina xwedawendbûn, rahîbetî û azadiya jinê ye. **Bila azadiya mîsoger bingeh bigirin**. Ew bi vînên xwe yên azad ve tên. Ew yên ku alîgirên azadiya mîsoger in. Wê bi vînên xwe yên azad û hilbijarkên xwe yên azad ve bixebitin. Ew vîn, zanebûn, hêza mezin pêwîst dike. **Ew neviyên Îştar in.**

★Koma duyem, komên perwerdevan in, karê wan tenê perwerde dayîn e. Wê bixwînin, lêbikolin, perwerde bidin. Weke teorîk-kiryarî pêş bikevin. Dikarin ji vê yekê re bêjin “talûb” jî, tê wateya şagirt.

★Koma sêyemîn; dikarin li gorî mîrasa Zerdeşt pevbijîn. Hûn dizanin, di kevneşopa Zerdeştî de pevjîna spartî vîna azad heye.

Zerdeşt pevjînekî baş ji bo ji jinê jî, ji bo zilam jî datîne. Divê rêbaza pêxember Zerdeşt bingeh bigirin; heskirin û rêzdayîna beramberê hev. Pevjînên ku niha tên kirin, ez li dijî vê me. Ev rêbaza Ereban e, ez li dijî pevjîna Ereba me. Lê ne li dijî pevjîna azad ya kevneşopa Zerdeşt im. Ev bi têgihîştina azadiyê ya beramber çêdibe, divê li ser bingeha azadiyê çêbibe.

★Pêwîst e têgehên di wir de hûn nîqaş bikin. Min gotibû malên jinê azad, perestgehên jina azad. Pêwîst e hûn li ser wan têgehan hûr bibin. Min gotibû pevjîna Zerdeştî. Divê li ser vê 5-10 pirtûk were lêkolan. Ramanên min ya li ser pevjîna Zerdeştî divê bikin pirtûk. Bisînor jî be li hember koletiya jinê derketinek heye. Pevjîna ji koka Samî bi kiryarî jinê kir kole. Min di parêznameyên xwe de jî vekiribû. Di bingeh de azadiya jinê ji ya çînan jî kevintir e. Hûn dizanin çîna destpêk jin e. Ereb û Cîhû (Yahudî) jî tê de ne. Di Îsa de nirx dayîna jinê hinek heye. Min gotibû rahîbe. Ew 12 hezar sal e hewl didin da ku xwe perwerde bikin. Jinan perwerde dikin. Min dîroka jinê ya 5 hezar salî vekir. Pêwîst e hûn xwe gelek perwerde bikin. Ji serî heya neynok ez dibêjim “perwerde”.

★We biryarên xweşik girtine. Di meclîsa PJA’ê de dayîkek jî cih girtiye., tiştekî erênî ye. Silav û rêzên xwe ji we re radigihînim. Lê biryar girtin ne bes e. Her yek ji wan meseleyek ya rêxistinê ye, divê bi rêxistinê were tackirin. Kîryarî wiha çêdibe. Bila ji siyaset heta aboriyê xwe rêk bixin. Nabêjim bila ji zilam cuda bibin, lê hêza xwe baş rêk bixin.

★Niha bi kurtayî tiştekî din bêjim. Lê di serî de divê mesela namûsê rast were nasîn. Min ji ber vê yekê xwest jina Kurd rakim ser piyan. Mêrik hem te dikuje, hem jina te, keça te nizanim çi dike û piştre dibêje ez axayê te me. Dema bi keçan re diaxivîm, ji bo ku şaş tênegihîn min mînakên dayîka xwe didan. Zilam hem can, mal û tiştê min ji destê min digire û piştre bi diya min re pevdije (dizewice). Ger tu her tiştî min ji destê min digirî û dikujî, tu çi ji dayîka min dixwazî. Ez wiha vekim, ez kûrê baş yê dayîka xwe me. Tu hem min dikûjî, dayîka min re pevdijî, dibî axa, mîrasa dayîka digirî. Li gel me meseleya namûsê ev e. Di serî de divê ev were kirin. Ger hûn vê yekê çareser nekin, wê kedên we vala biçin. Hûn çiqasî hewl bidin, wê hindek werin li ser rûnin. Pêşmerge dibêjin "em herin keçên PKK'ê bibin. Nêzîkbûnên wan li holê ne. Tu wê bi wan re parastina çi bikî? Keçek hebû, Berîtan. Ji bo xwe radestî paşverûtiya Kurdan neke, xwe li ser zinaran avêt. Li gundek nêzîkî Karakoçanê bû. Pêşmerge li ber digerin û dibêjin: "Teslîm bibe, em tiştek li te nakin". **Xeta azadiyê ku ez bingeh digirim ev e**. Lê wê xwe radestî paşverûtiyê nake. Azadiyê bingeh digire. Parastina rûmeta azadiyê ya wê keçê, deynê li ser stûyê me ye. Ev rêgeza min e. Ez Berîtan wiha dinirxînim. Vê yekê baş ragihînin. Cara yekê ye ku wiha tînim ziman. Piştre bi rengê nameyekê emê vekin.

★Tesbîtekî yê nivîskarekî İngilîz hebû. Ez bawerim dikeve rewşekî zor. Keça Kurd ya li gel wî, wî ji vê rewşa zor rizgar dike. Nivîskar li ser vê bûyerê wisa dibêje. "Piştî ku min vê tevgerîna jina Kurd dît, min bawerî da ku jina Kurd dikare her tiştî bike". Îngilîz mirovên biaqil in, wisa ji xwe ve nabêjin. Ez jî bawerim jina Kurd şeref û azadiyên xwe bi dest bixin. Ez bawer dikim, her tişt wê ji destê jina Kurd were. Hûn li welata xwedawendan dijîn. Ez ji we bibawer im nekevin nava şaşiyan. Hûn dibêjin em bi te ve girêdayî ne. Wisa ne hêsanî ye. Ez bawer im, hûn zorê serbixin. Me pêşiya jinê vekir, derfeta azadiyê afirand. Divê hûn binirxînin. Bi tu awayê din namûs, jiyan nabe.

★Min bihîst kulîlkê min şandî gihîştiye, bi coş hatiye pêşwazkirin. Me ji bo vê li vê derê bi rêveberiya (îdare) re gelek vecelîd (cebelleştik). Weke "te çawa şand" ew kirin, gotin "qedexe ye, fîlan û bêvan". Kulîlkên mayîn jêkirin. **Kulîlk sembolek e, yê girîng pêkanîna kulîlkvedana jinê ye.**

★Kûrbûna xwe bidomînin. Divê hûn bi hêzên demokrasî yên li Tirkiyê bi têkilbin. Tiştên ku hûn di wê qadê de bikin, pêwîst e hebe. Ez bawer im hêzên jinê bi hêz dibin. Ji nîşka ve pêşketin çênabe. Dînazorên 5000 salî ji nîşka ve naguherin. Divê hûn bawerî bidin hêza xwe ya cewher. Divê hêzên wê yên rewa hebin. Ez nabêjim bibin wek rahîbe. Lê azadiya xwe kîp himbêz bikin. Divê hûn kedê bidin, bi hedar bin. Li benda tu kesî nemînin ku we pêş bixe. Heta desteka min jî bisînor bibe. **Ez bawerî didim hêza jinê. Dibêjin; "wê karkerên hatîn perçiqandin cîhanê rizgar bikin". Ez jî dibêjim; "jin wê cîhanê rizgar bikin**". Di Musa de, di Mihemed de bilindbûnekî li ser bingehê zilam heye. Di Xirîstiyaniyê de kêm jî be bi figûra Meryem heye, lê bisînor e. Min di rojnameyê de xwend. Li Îranê bisînor jî be, li ser pêşxistina azadiya jinê dest bi pêkanîna malên namusê (îffet) hatiye kirin. Ecêb e, wekî ku min dişopînin, ez wisa dihesim. Min berê gotibû malên azadiyê. Hûn dikarin di her welatê de malên wiha ava bikin. Hûn dikarin di destpêkê de hin navên xwedawend weke Înanna bikar bînin, malên wiha saz bikin. Di vê mijarê de ramanên weke baran tên bîra min. Ez wan her heftê di warê têbîniyên biçûk de, ezê hewl bidim ku wiha ragihînim ji bo we.

★Min kûlîlk dabû we, min vegotibû ka ev çiqas pirsgirêk çêkir. Di demên bûrî de dîsa rewşekî mîna vê çêbû. Di kulekê (havalandirma) de şînkayiyek çêbûbû. Tiştekî wek striyê bû, ne kûlîlk jî bû. Min girt, anî oda xwe. Wek ser oda girtin, lê gerîn. Piştre jî tevayî şînkayiyên di kulekê de jêkirin. Min got; "çi ye, çi heye, çi çêdibe? Çima ewqas mezin dikin?" Lê berxwedanekî wisa qebe ranexist, min pêwîst nedît. Naxwazin ku ez kûlîlkekî jî bidim we. Çima? Di zanedariya pozîsyona (rewş) min de ne. Wan bûyeran ji yên ku dibêjin "li Îmrali bi dewletê veşare re pêyman daniye, di wir de weke qralan dijî" re baş vebêjin. Lê ez ji xwe re nakim mesele. Ne pêwîst e. Lê belê ji bo ku hûn mercên ez tê de bîzanin, diyar dikim. Di bingeh de em dikarin meseleya kulîlk wisa vekin. **Li ser navê min dikarin kulîlk bidin herkesî. Herkes dikare kulîlk bide hev. Em dikarin kevneşopekî wiha biafirînin**. Di nameyên hatîn de fîgûrên kulîlk hatibû karanîn. Ez jî

dixwazim wiha bersiva wan bidim. Ger destûr neyê dayîn, em dikarin wiha derbas bikin, herkes di nameyên xwe de dikare bikaranîna kulîlka bidomîne.

★Nivîskarê Îngilîz di pirtûka xwe ya "Bermayên Nînowa" de piştî ku dîtiye jina Kurd di demekî zor de xwe ji pencere diavêje û yên di rewşa zor de mayîn rizgar dike, dibêje "min bawerî da ku jina Kurd dikare her tiştî bike". Tevî hemû kêmahî û nebesiyên xwe, keç û jina Kurd mîna jinê Ewropayî tam nebûne jinokî. Min vê aliyên wan dît, min ji bo azadiya jinê hewla mezin da. Min li Romayê gotibû, "projeya jina azad nîvçe ma". Lê di encama lêhûrbûna min ya li vê derê, min kûrtir kir û vê yekê şewqdana parêznameyan kir. Gelo hewldana min ya di têkoşîna azadiya de tê lêkolan? Di vê mijarê de kesên lêgerîna xwe heyîn hene? Di mijarê jin û êş, jin û edalet jin û azadî, jin û hûner, jin û xweşikbûn de divê lêkolîn werin kirin, divê werin pirtûk kirin. Min gotibû Peyman Civakî. Bawer im wê kirin pirtûk. **Jina xweşik, wêrek, xwedî vîn, dikare cîhanê fetih bike**. Ez tu carî weke jinekî tam, li nêzîkê jinê nebûm. Hin jin û zilam li dijî vê har bûn. Aliyekî mezin yê tepkiyê wan ji wê ye. Di dîrokê de jî du xet hene; xeta Musa û Zerdeşt. Xeta Zerdeşt xwe dispêre civaka neolîtîk ku di qontara çiyayên Toros-Zagros de bi çandin û xwedîkirina heywanan ve xerîk dibin. Ji serdestiya zilam zêdetir, aliyê vê yê wekheviyane, ji azadiyê re vekirî heye. Xeta Musa heta dirêjî Sûmer dibe. Piştre xeta jinê ya bi Meryem pêşketî, bi pevjîna yek kesî ve li Ewropayê hîn jî didome.

★Her nasnameya xwe dibînin, her ku azad dibin, ez bawerim hûn matmayî dimînin¸kifşa cîhanekî nû dikin. Divê hûn xebatên xwe li ser bingeha Akademiya Azadiyê bi rêve bibin. **Tiştekî ku cesaret û vîn nikae fetih bike nîne. Yên îdîa û hêrsa xwe heyîn vê yekê bi ser dixînin.**

★Dikarin materyalên perwerdeya kêşeyên Sûmer û Misir lêbikolin. Min di vê derê de çar sal perwerdeya yek kesî dît. Min di tarîtiyê de, di mercekî bêhewa de pêk anî. Dikarin vê yekê mînak bigirin. Hûn dikarin li ser xebatên çand û aborî hûr bibin. Dikarin giranî li xebatên demokratîk û hûnerê bidin. Ev karê pîroz in. Min berê jî diyar kiribû; di vê mijarê de ramanên weke baran tên bîra min. Şerm û kîrêtiya bi hezaran sal me rûxand, merxasî, hedarî û wêrektiyê derxist holê. Ev yek min şanaz dike, ez rûmetiya vê dihilgirim. **A gûl pêl bi pêl belav bûye. Şoreşa jinê şoreşa gûl e. Ev yek eşkere bûye**.